



MEDENİYETLER
KAVŞAĞINDA BİR KENT
SİVEREK

Dil | Din | Edebiyat

Editörler
İbrahim ÖZCOŞAR
Ahmet KIRKAN
Ekrem AKMAN
Abdusselam ERTEKİN

MEDENİYETLER KAVŞAĞINDA BİR KENT: SİVEREK

DİL-DİN-EDEBİYAT

Editörler

İbrahim ÖZCOŞAR

Ahmet KIRKAN

Ekrem AKMAN

Abdusselam ERTEKİN

Çizgi Kitabevi Yayınları:1416
Tarih

©Çizgi Kitabevi
Ekim 2022

ISBN: 978-605-196-865-0
Yayıncı Sertifika No:52493

KÜTÜPHANE BİLGİ KARTI
- Cataloging in Publication Data (CIP) -
Editörler

ÖZCOŞAR, İbrahim | KIRKAN, Ahmet
AKMAN, Ekrem | ERTEKİN, Abdusselam
MEDENİYETLER KAVŞAĞINDA BİR KENT: SİVEREK
DİL-DİN-EDEBİYAT

Makalelerin sorumluluğu yazarlara aittir.

Siverek Belediyesi'nin katkılarıyla basılmıştır.
Kapak Fotoğrafları Hüseyin Demirbağa Aittir.

Baskıya Hazırlık: Çizgi Kitabevi Yayınları
Tel: 0332 353 62 65- 66

Baskı: Sebat Ofset
Sertifika No: 46039

ÇİZGİ KİTABEVİ

Sahihiata Mah. | Alemdar Mah.
M. Muzaffer Cad. No:41/1 | Çatalçeşme Sk. No:42/2
Meram/Konya | Çağaloğlu/İstanbul
(0332) 353 62 65 - 66 | (0212) 514 82 93

www.cizgikitabevi.com
/ cizgikitabevi

İÇİNDEKİLER

TAKDİM	9
YILMAZ KARAKOYUNLU'NUN <i>SALKIM HANIM'IN TANELERİ</i> ROMANININ BENLİK-ÖTEKİLİK HALLERİ AÇISINDAN ÇÖZÜMLENMESİ.....	11
Yunus CENGİZ	
AHMED ARİF'İN ŞİİRLERİNDE VAROLUŞÇU DURUMLAR	23
Necip UYANIK	
SÊWREGI DE ZIWAN Û DIMİLÎ	35
Haydar DILJEN	
QERTAFÊN DARİŞTÎNÊ DI ZAZAKÎYA SÊWREGÊ DA	45
Fahri KARACA	
HIZIR MİTOSU ÜZERİNE BİR ÇÖZÜMLEME: SİVEREK ÖRNEĞİ	69
Büşra GÖKALP	
SÊWREGI RA TAYE NUMÛNEYÊ İDYOMAN.....	81
Kafur SEÇİLMEK	
TEMSÎLA DENGÊN KURDÎ DI ALFABEYÊN KURMANCÎ, SORANÎ Û ZAZAKÎ YÊN BI TÎPÊN EREBÎ Û LATÎNÎ DE ..	109
Hüseyin KAÇMAZ	
EDEBİYATÊ ZAZAKÎ DI CAYÊ NUŞTOĞANÊ SÊWREGIJAN	129
Murat VAROL	
ZAZAKÎYA ÇOLİGÎ U SÊWREG DI İZAFEVÎ	139
Ayetullah KARABEYESER	
MOLUDÊ BABIJÎ SERA TİVERANAYİŞÊ ZAZAKÎYA SÊWREG U BOGLONÎ.....	147
İsmail SÖYLEMEZ	

MILLA CIMAYO BABIJIN ZAZACA SİYERÊ NEBÎ ESERİNİN ŞEKİL ve MUHTEVA BAKIMINDAN DEĞERLENDİRİLMESİ	163
Hatip ERDOĞMUŞ	
WEKÎ HEREMEKE TRANSÎT KURMANCÎYA BERFIRATA SIWEREGÊ.....	181
Mehmet YONAT	
“PEPÛKÎ MA RÊ ÇI VANA”: BÎ AWAYEKÎ MIQAYESEYÎ NÎRXANDÎNEK LÎ SER EFSANEYA PEPÛKÊ DÎ KURMANCÎ Û ZAZAKÎ DE	195
Ömer DELİKAYA Zafer AÇAR	
MULEMME'A PÊNC-ZIMANÎ YA ÎBRAHÎM RE'FETÊ SÊWREGÎ (1875-1938) Û CİHÊ WÊ DI MULEMME'NÛSÎYA KURDÎ DE	215
M. Zahir ERTEKÎN Abdulhadi ERTEKÎN	
ANALÎZEK LI SER MULEMME'ÊN OSMAN EFENDÎYÊ BABIJ	229
M. Zana KARAK	
REWŞENBÎREKE KURD LI MÎSRÊ MUHEMMED ELÎ EWNÎ SOREKÎ (1897-1952)	247
Nesim SÖNMEZ	
ZAZACAYA ADANMIŞ BİR ÖMÜR: HOCA ŞABAN ŞENATEŞ	263
Ali İLHAN	
HİLMÎYÊ SÊWREGÎ Û DI EDEBÎYATA KURDÎ DE CİHÊ WÎ	281
Seher BİŞAROĞLU	
DENGBÊJÎ Û DENGBÊJÊ NAVDAR Ê SÊWREGÊ ŞUKRÎ İZOL.....	295
Mesut CANDAN	
SİVEREK'TE KÂDİRİYYE TARİKATI	311
Abdurrahim ALKIŞ	
SÊWREGI DE EDEBÎYATÊ DÎNÎ RA NİMÛNEYÊK: TERAWÎHNAMEYÊ HECÎ HUSEYİNÊ TİLÎ	327
Ahmet KIRKAN Abdusselam ERTEKÎN	
CUMA ÖZUSAN (MİLLA CIMAYO BABIJ) ve “SİYERÊ NEBÎ BÎ ZİWANÊ DİMİLÎ” ADLI MANZUM ESERİ	347
Cuma KARAN	

ANALÎZEK LI SER MUCÎZEYÊN HZ. PÊXEMBER ÊN DI MEWLÛDNAMEYA USMAN ESAD EFENDÎYO BABIJ DE ..379
Ayhan YILDIZ

SÎVEREK LÎ DÎVÂN ŞAİRÎ İBRAHİM RE'FET'İN ŞİİRLERİNDE PEYGAMBERLER ve DİĞER DİNÎ ŞAHSİYETLER. 393
Halil KIZILTOPRAK

SÎVEREK LÎ İBRAHİM RE'FET'İN MEVLİD'İNDE HZ. PEYGAMBER..... 403
İdris SÖYLEMEZ

HETÊ ZONÎ RA TÎVERANAVÎŞÊ MOLUDANÊ XASÎ U BABIJÎ 423
İsmail SÖYLEMEZ

**SÎVEREK ASILLI MUHAMMED ALÎ el-KÛRDÎ'NİN *el-MEVSU' ATÛ'L-KÛBRÂ LÎ MEŞÂHİRÎ'L-KURD*
'ABRE'T-TÂRÎH ADLİ ESERİNDEKİ KIRAAT ÂLİMLERİ 435**
Rifat ABLAY

**MUHAMMED ALÎ ES-SÎWÊREKÎ EL-KÛRDÎ'NİN
"MÛ'CEMU E'LAMÎ'L-KÛRD" ADLİ ESERİNDE GEÇEN KÛRT KIRAAT ÂLİMLERİ 451**
Mustafa ACAR

TERZÎZÂDE HÂFİZ FİKRÎ EFENDÎ ve SÎVEREK'TEKİ KUR'ÂN EĞİTİMİ ÇABALARI 469
Lokman ŞAN

SÊWREGİ RA TAYE NUMÛNEYÊ SANIKAN 477
Kafur SEÇİLMEK

NİMÛNEYÊ EDEBİYATÊ ZAZAKÎ YÊ KLASİKÎ: SÊWREGİ RA ÇEND BEYTÊ DÎNÎ 501
Murat BAŞARAN

SÎVEREK SINIRLARINDA BİR DIMİLÎ AŞİRETİ: KARACADAĞ MEHELİLERİ 521
Pınar YILDIZ

DI ROMANÊN MEHMET UZUN DE POZİSYONA ÇANDÊ..... 553
Mehmet Şirin FİLİZ

BI FEKÊ SÊWREGÎ YA HEWT ESTANİKÎ..... 559
Yakup TAŞÇI

SËWREGİ DE EŞİRË ZAZAYAN (DIMİLİYAN)Û ZAZAKİYA (DIMİLKİYA) İNAN	577
Murat BAŞARAN	
SİVEREK'TE DİN ve TOPLUM İLİŞKİLERİ.....	593
Tuba ÖKENEK	
POPÜLER DİNDARLIK BAĞLAMINDA KOÇ ALİ BABA TÜRBESİ	611
Behlül TOKUR Zeynep ORTAKAYA	
SİVEREK'TE KAYBOLMAKTA OLAN GELENEKSEL BİR GİYİM KUŞAM UNSURU: İGGAL/EGAL	621
Hanım Handan AĞIRMATLI	
PİRİNCİN DOĞU ASYA'DAN MEZOPOTAMYA YOLCULUĞU ve KARACADAĞ PİRİNCİ	645
Mustafa EMRE	
SİVEREKLİ RAMAZAN ÖZGÜLTEKİN'İN SİVEREK SOSYAL ve KÜLTÜRÜNE SAĞLADIĞI KAZANIMLAR	657
Muhammed Şerif AZARKAN	

TAKDİM

Siverek Osmanlı Devleti yönetiminde klasik sancak statüsünde bir kaza merkezi idi. Daha sonra mutasarrıflık ve vilayet merkezi olmuş Mezopotamya ve Anadolu kavşağında kadim bir şehirdir. Tarihten miras aldığı pek çok kültür varlığını günümüze taşıyabilmiş, tarihi kalesi, kendine has küçeleri, taşın ilmek ilmek işlendiği evleri ve konaklarıyla maddi kültürünü; dili ve renkli yapısıyla manevi kültürünü ve özünü koruyarak günümüze kadar gelmiş ve bu öğeleri bizlere emanet etmiştir. Şehrimizin fiziki varlıkları yanında henüz tam anlamıyla keşfedilmemiş coğrafyasında Karacadağ ve etrafındaki doğal mağaraları, Fırat havzası ve Takoran vadisi gibi kültürel zenginlikleriyle beraber; dillerin ve kültürlerin doğal bir havzası olmasıyla da farklı türden zenginlikleri kendisinde barındırmaktadır. Bu kadim şehirde pek çok âlim, sanatçı, yazar ve bilim adamı yetişmiş bunlardan bir kısmının şöhreti ülke sınırlarımızı aşmıştır.

Şehrin köklü geçmişini gelecek nesillere aktarmayı belediyeciliğin önemli bir görevi bilinci ile kültürel zenginliğini ortaya koyan bilim adamları akademisyenler ve araştırmacıların büyük emekler vererek ortaya koydukları eserlere sahip çıktık. Siverek'e dair araştırma yapan ve eser üreten 100'de fazla akademisyen ve araştırmacıyı bir araya getirerek onlara ev sahipliği yaptık. Bu çalışma ve gayretlerin sonucunda bilim dünyasına ve Siverek'in tarih ve kültürüne ışık tutacak iki ciltlik dev bir eser ortaya çıktı. Bu eseri sizlere sunmaktan ve şehrimizin kültür dünyasına bu eserleri kazandırmaktan, kendim ve beraber çalıştığım ekip arkadaşlarım adına, gurur duyuyorum.

Yüzden fazla akademisyen ve araştırmacının şehrimizi teşrif etmelerini sağlayan ve bu eserin ortaya çıkmasında emeği geçen başta Mardin Artuklu Üniversitesi Rektörü hemşerimiz sayın Prof. Dr. İbrahim Özcoşar beyefendiye; şehrimize dair çok önemli çalışmalara imza atan ve bundan sonraki çalışmalarını merakla beklediğimiz Ekrem Akman, Ahmet Kırkan ve A.Selam Ertekin hocalarıma teşekkür etmek istiyorum. Son olarak da bu çalışmaların devam etmesini ve Siverek'imizin hak ettiği değeri görmesini ümit ediyorum.

Ayşe ÇAKMAK

Siverek Belediye Başkanı

2022 Siverek

HILMÎYÊ SÊWREGÎ Û DI EDEBÎYATA KURDÎ DE CIHÊ WÎ

Seher BÎŞAROĞLU*

Destpêk

Dema em li atmosfera sedsala XXem mêze dikin, tê dîtin ku li ser kelûpelên gel vegerek heye. Lewra fikra “neteweyî”yê tesîr li ser gelan kiriye ku gel bikevin pey dîroka xwe û bikevin nav hewla berhevkirina materyalên gelêrî. Armanca rewşenbîrên wê heyamê ew bû ku bi vî awayî hebûna xwe bidin qebûlkirin ku ew jî xwedî dîrokeke qedîm in. Dema em li wê serdemê mêze dikin Kurdên rewşenbîr jî hem ji ber têkilîyên xwe yê bi rewşenbîrên bîyanî re hem jî ji ber têkilîya wan ya bi rewşenbîrên Osmanî re dest bi berhevkirina kelûpelên Kurdî kirine. Ew dixwazin îsbat bikin ku Kurd xwedî nasnameyeke neteweyî ne, yek ji niştecihên qedîm ên Rojhilatê ne û folklorê wan dewlemend e.¹ Em dibînin ku rewşenbîrên Kurd jî bi helwesta îsbata ku ew jî yek ji milletên qedîm e û xwedî dîrokeke kevn e û xwedî kelûpelên edebî ne. Ji ber vê yekê Kurd jî ketine nav helwesta berhevkirina materyalên çandî, edebî û dîrokî.

Remezan Pertew di pirtûka xwe ya bi navê *Folklor û Nasnameya Kurdî (1898-1946)* de ji Herder weha neqil dike: “Herçî valahîya di navbera niha û rabirdûyê de bû, mirov dikaribû wê bi rêya helbesta gelêrî dagire û bi vî awayî rûhê neteweyî jî kifş bike.”² Kurd jî ketine nav wê helwestê ku bi saya materyalên gelêrî rûhê xwe yê neteweyî kifş bikin û xwe di nezera gelên din de bidin qebûlkirin. Ji ber vê yekê di wê serdemê de gelek kovar û rojnameyên Kurdî dest bi weşanê kirine.

Kovara Jînê û rojnameya Serbestî jî ji weşanên wê serdemê du weşan in ku li ser vê armançê dest bi weşanê kirine. Hilmîyê Sêwregî jî yek ji wan rewşebîran e ku li ser vê armançê nivîs, gotar û helbest nivîsîne. Di vê gotara xwe de em dê li ser Hilmîyê Sêwregî û berhemên wî rawestin. Herweha em dê bi kurtasî behsa wan kovar û rojnameyan bikin ku wî jî tê de nivîsîne.

* Xwendekara Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Beşa Ziman û Çanda Kurdî, Diyarbakır-Türkiye, e-mail: seherbisar@gmail.com

¹ Ramazan Pertev, “Xebateke Girîng di Dîroka Folklorê Kurdî de: Kemal Fewizî û Berhevkariya Çirokên Kurdî”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, cild: 2 hej. 3, 2016, r. 44.

² Ramazan Pertev, *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî (1898-1946)*, Weşanên Avesta, Stenbol 2018, r. 64.

Kovara Jînê

Kovara Jînê di sala 1918an de dest bi weşanê kiriye û bi tevahî 25 hejmar çap bûye. Di hejmara ewil a kovarê de hatiye gotin ku ev kovar ne ji bo armanca maddî derdikeve. Kovar ji bo belavkirina zanînê ye. Endamên kovarê xwestine ku bi vê kovarê di nav Kurdan de hişyarîyekê bidin destpêkirin. Heqên wan yên neteweyî, dîroka wan û rewşa wan ya civakî bi wan bidin zanîn. Bi vê helwestê kovara Jînê bi qasî salekê weşana xwe domandiyê. Hejmara dawî ya kovarê di dîroka 2/10/1919an de derketiye. Piştî vê dîrokê kovar hatiye girtin.

Kovara Jînê bi zimanê Kurdî û Tirkîya Osmanî çap bûye. Di kovarê de bi zarevayên Kurmancî û Soranî nivîs derketine. Berpirsyarê kovarê heta hejmara 20an Hemzeyê Muksî bûye. Ji hejmara 21ê heta 25an jî berpirsariya kovarê Memduh Selîm kiriye. Di kovarê de gotar, helbest û nivîsên kesên weke: Pîremerd, Xelîl Xeyalî, Kemal Fewzî, Evdirehîm Rehmî Hekarî, Law Reşîd, Hilmîyê Sêwregî, Îhsan Nûrî, Kamuran Elî Bedîrxan, Qazîzade Mistefa Şewqî, Qazîzade Letîf, Huznîyê Dêrsîmî, Mîrzayê Cizîrî û hwd. weşiyane.

Di kovara Jînê de ligel nivîsên mijarên wê serdemê û folklorîk hin helbestên klasîk yên Kurdî jî hatine weşandin. Di kovarê de helbestên Ehmedî Xanî, Melayê Cizîrî, Sîyahpoş, Nalî, Hecî Qadîrê Koyî û hwd. jî hatine weşandin.³

Rojnameya Serbestî

Rojnameya Serbestîyê di sala 1908an de ji alîyê Mewlanzade Rifat û Hasan Fehmî ve dest bi weşanê kiriye.⁴ Hejmara dawî ya Rojnameya Serbestîyê di sala 1920an de çap bûye û rojname bi tevahî 770 hejmar derketiye.⁵ Di rojnameyê de nivîsên kesên weke; Hasan Fehmî, Mevlanazade Rifat, Şerafettînê Mexmûnî, Seîdê Kurdî, Miradê Mîzanci, Ebdurrehman Tehsîn, Ahmet Sıtkı, Ali Ulvi, Avanzade Mehmed Süleyman û hwd.⁶ weşiyane.

Hilmîyê Sêwregî bi nasnava “Siverekli Hilmi” gotarek di vê rojnameyê de weşandiye.⁷ Herweha hin hejmarên vê rojnameyê ne li ber destan e û dibe ku hin nivîsên din yên Sêwregî di siberojê de derkevin holê.

³ Me ji bo hemû hejmarên kovara Jînê jî hemû cildên berhevkarîya M. Emîn Bozarslan sûd wergirtin. Ji bo agahiyên berfirehtir derheqê kovara Jînê bnr.: M. Emîn Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî & Kürdçe-Türkçe Dergi (1918-1919)*, c.1-2-3-4-5, Weşanxaneya Deng, Uppsala 1985, n.r. 5-8.

⁴ Mustafa Coşkun, “*Mevlanazade Rifat Bey’in Gazetecilik Hayatı ve Siyasi Faliyetleri*”, Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Tarih Anabilim Dalı Türkiye Cumhuriyeti Tarihi Bilim Dalı), İstanbul 2019, r. 47.

⁵ Serbestî Gazetesi ve Mevlanazade Rifat Bey- Bernamegeh <https://www.bernamegeh.com/serbesti-gazetesi-ve-mevlanazade-rifat-bey/> (26.04.2022)

⁶ Coşkun, “*Mevlanazade Rifat Bey’in Gazetecilik Hayatı ve Siyasi Faliyetleri*”, r. 47.

⁷ Ji bo agahiyên berfirehtir derheqê gotara Sêwregî de bnr.: Seîd Veroj, *Mevlanazade Rifat û Serbestî, Weşanên İBV, Stenbol 2017 n.r. 274-275.*

Jîyana Hilmîyê Sêwregî

Derheqê jîyana wî de agahîyên zêde li ber destê me tune ne. Hilmîyê Sêwregî di navbera salên 1900-1959ê⁸ de jîyaye û li Stenbolê wefat kiriye. Ji navçeya Sêwregê ya Rihayê ye. Navê wî yê fermî Hilmî Ergün e. Hilmîyê Sêwregî li Stenbolê di peymangeha

PTTê de xwendîye û li postaxaneya Stenbolê weke rêvebir xebitîye û ji vir teqawid bûye.⁹

Pêvek 1: Wêneyê Hilmîyê Sêwregî.



Li gor ku Seîd Veroj di pirtûka xwe ya bi navê *Potreyên Şophîştî-I* de dîyar dike Hilmîyê Sêwregî kesekî welatparêz bûye û wî girîngîyekî daye perwerdeya zarokan, çand û zimanê Kurdan.¹⁰ Dema mirov gotar û helbestên Sêwregî dixwîne ev yek bi awayekî eşkere xuya dike. Wî di van gotar û helbestan de fikr û ramanên xwe anîye ziman.

Hilmîyê Sêwregî rewşenbîrekî sedsala 20em bûye. Di kovara Jînê û di rojnameya Serbestîyê de nivîsên wî weşîyane. Wî di kovara Jînê û rojnameya

⁸ Dîroka mirina Hilmîyê Sêwregî di pirtûka Remezan Pertev de weke 1951 hatiye nivîsîn.

⁹ Ji bo Agahîyên berfirehtir bnr.: Ramazan Pertev, *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî (1898-1946)*, (Stenbol: Weşanên Avesta, 2018), r. 229.; Seîd Veroj, *Potreyên Şophîştî-I*, Weşanên Dara, Diyarbekir 2019, r. 275.

¹⁰ Veroj, *Potreyên Şophîştî-I*, r. 276.

Serbestîyê de ji dêvla navê xwe navên mustear ên weke Hilmîyê Sîwerekî, Hilmî û Siverekî Hilmî bi kar anîye.

Berhemên Hilmîyê Sêwregî

Hilmîyê Sêwregî di kovar û rojnameyên weke Jîn û Serbestî yên sedsala 20em de nivîs, gotar û helbest nivîsîne. Nivîsên wî yên kovara Jîn ev in:

Kürt Gençlerine (Ji bo Ciwanên Kurd): Kovara Jînê hejmar 8, sala 1918.

Kentliler ve Köylüler (Bajarî û Gundî): Kovara Jînê hejmar 13, sala 1919.

Gazindek: Kovara Jînê hejmar 16, sala 1919.

Kürdlerde Durûb-î Emsal (Di nav Kurdan de Gotinên Pêşîyan): Kovara Jînê hejmarên 14, 19 û 24.

Ji bo Zarwê Kurdan-1 Serê Sibê: Kovara Jînê hejmar 22an, sala 1919.

Ji bo Zarwê Kurdan -2 Yekdeng: Kovara Jînê hejmar 25an, sala 1919.

Nivîsên wî yê Rojnameya Serbestîyê;

Aziz Kürdistan (Kurdistana Ezîz): Rojnameya Serbestî, hejmar 492, sala 1919.

Gotarên wî

Kürt Gençlerine (Ji bo Ciwanên Kurd)

Hilmîyê Sêwregî vê gotara xwe bi zimanê Tirkî nivîsîye. Sêwregî di vê gotara xwe de bangî ciwanên Kurd dike. Dibêje hêvîya welat ji we heye, çiyayên welêt, newal û deştên welêt, xan û malên welêt bangî we dikin û ji we bi hêvîne. Sêwregî girîngî daye ciwanan, şîret li wan kiriye û rê nîşanî wan daye. Sêwregî weha bangî ciwanan kiriye: “wextê xebata we hatiye divê hûn bi pênuşa xwe û bi wêrekîya xwe dest bi xebatê bikin; ranezên, em di rojên muhîm de derbas dibin. Wezîfeyên ku îro li we hatine spartin gelekî girîng in û hewceye hûn bibin yek û wisa bixebitin. Tenê ji bo gelê xwe bixebitin”. Sêwregî bal kişandiye ser zimanê Kurdî û dîroka Kurdan û dibêje “ziman û dîrokeke me ya qedîm heye ku heta îro hatiye îhmalkirin û em xwedî dîrokeke dewlemend in”.¹¹

Kentliler ve Köylüler (Gundî û Bajarî)

Ev gotara Sêwregî jî bi Tirkî hatiye weşandin. Di hejmar 11an a kovara Jînê de ciwanekî Kurd li ser hîsîyata qewmî ya Kurdên bajarî û gundî sekinîye. Di vê mijarê de ciwanê Kurd teredduttên xwe anîye ziman û rexne li komeleyên

¹¹ Hilmîyê Sêwregî, Kürt Gençlerine, *Jîn*, Hejmar 8.

Kurdan yê li Stenbolê girtiye.¹² Sêwregî jî di vê gotara xwe de bersiv daye vê nameya ciwanê Kurd. Sêwregî di vê gotara xwe de li ser Kurdên gundî û bajarî sekinîye û li gor wî di navbera wan de ti problem tune ye û ji hev re rêzdar û alîkar in. Lêbelê divê gundî ji cehaletê werin xelaskirin û ev wezîfe jî dê ya ciwanan be.¹³

Gazindek

Ev gotara Sêwregî di hejmara 16an a Kovara Jînê de çap bûye. Sêwregî di vê gotara xwe de gazinan dike. Gazina wî ya ewil ev e ku bersivê dide wan kesên ku jê re dibêjin tu çima gotarên xwe bi Kurdî nanivîsî. Sêwregî dibêje ku zimanê Kurdî ne yek e. Di nav ziman de hev girtinek tune ye. Helbet qesta Sêwregî zarave û devokên Kurdî yê li deverên cuda ne. Li gor wî Kurdekî Dimilî ji yê Colemêrgî baş fêm nake. Sêwregî dibêje ez dixwazim ku hemû Kurd ji hev fêm bikin.

Sêwregî dibêje 400 sal zêdetir e ku me desthilatdarîya xwe wenda kiriye û em di bin hikûmranîya xelkê de dijîn. Divê em êdî dest bi xebatê bikin û ji vê rewşê xelas bibin. Sêwregî dibêje ku mezinên me bi mal û pereyên xwe zarokên xelkê mezinkirine û zarokên xwe nezan, nexwende û cotkar hiştine. Ew fileyên ku li ber destê me bûn xebitîn zarokên xwe şandin welatan, perwerde kirin û ew hînî sin'et û bazirganîyê bûn, piştî vegeerîyan û gora me kolan. Sêwregî dibêje em îro dest vala mane û kes li me xwedî dernakeve. Ji ber vê yekê ji me re fesadî ne lazim e. Divê em bixebitin û bi pêş bikevin û bibin yek, lewra birînek di singa welatê me de vebûye û bi kesekî ew birîn pak nabe. Ji ber vê yekê divê em bibin yek û xwe ji vê rewşê xelas bikin. Sêwregî dibêje gumana min ji xîret û mêranîya gelê Kurd tune ye, lê kesekî ku îro Kurdan ji xew rake jî tune ye. Li gor Sêwregî vî karê girîng îro Kovara Jînê girtiye ser milê xwe.¹⁴

Em ji vê gotara Sêwregî jî fêm dikin ku armanca wî hişyarkirina gelê wî ye û hewldana wî ya ji bo ziman û gelê Kurd e. Ew dixwaze Kurdên li hemû dever û herêman bibin xwedî zimanekî hevpar û ji hev baş fêm bikin.

Kürdlerde Durûb-î Emsal (Di Nav Kurdan de Gotinên Pêşîyan)

Sêwregî bi heman sernavê di sê gotaran de li ser gotinên pêşîyan sekinîye. Zimanê her sê gotaran jî Tirkî ye. Ev gotar di hejmarên 14, 19 û 24ê kovara Jînê de weşîyane. Sêwregî di van her sê gotaran de bi tevahî li ser 46 gotinên pêşîyan sekinîye. Sêwregî di van gotaran de çîrokên hin gotinên pêşîyan jî pêşkêş kiriye

¹² Ji bo agahîyên berfirehtir bnr. Hilmîyê Sêwregî, "Kentliler ve Köylüler", *Jîn*, Hejmara 13.

¹³ Ji bo agahîyên berfirehtir bnr. Hilmîyê Sêwregî, "Kentliler ve Köylüler", *Jîn*, Hejmara 13.

¹⁴ Hilmîyê Sêwregî, *Gazindek*, *Jîn*, Hejmara 16.

û herwiha Sêwregî hem gotinên pêşîyan yên Kurmancî hem jî yên Dilmilkî di van gotaran de pêşkêş kiriye.

Sêwregî di gotara xwe de jî bo gotinên pêşîyan weha dibêje:

“Hêjayî gotinê ye ku her gotinek (pêşîyan) bîranîneke nemir a bûyerekê ye û dîrokeke zindî ye; her hevokek qanûneke sirûştî ye û li ser tecrubeyan hatiye avakirin. Gotinên pêşîyan ne ew gotin in ku di xeyalên mirovan de û li gor daxwazê hatine çêkirin.”¹⁵

Li gor Sêwregî gotinên pêşîyan ne hatine çêkirin û her yek jî wan xwedî çîrokekê, xwedî bûyerekê ye. Gotinên pêşîyan li ser tecrubeyan derketine holê û hin jî van gotinên pêşîyan tevî çîrokên xwe hatine tomarkirin û piraniya wan jî nehatine qeydkirin. Li gor Sêwregî tomarkirina gotinên pêşîyan dîsa wezîfeyeke ciwanên Kurdan e. Ji gotina Sêwregî em fêhm dikin ku wî di tomarkirina gotinên pêşîyan de daye dû rêça Law Reşîd. Wî ev yek di gotara xwe de weha anîye ziman:

“Ez jî wek birayê xwe Law Reşîd ku kiriye, jî berê ve gotinên pêşîyan yên ku di bîra min de mane, hin jî wan jî tevî çîrokên wan dinivîsim. Ez soz didim ku tiştê ku min bi dest xistiye ez ê di kovara Jînê de pêşkêşî xwênerên xwe yê bi rûmet bikim. Serkeftin ji Xwedê ye.”¹⁶

Sêwregî di gotarên xwe de gotinên pêşîyan wergerandiye ser zimanê Tirkî û di hin cihan de tevî wergera wan a bi Tirkî, cih daye wê gotina pêşîyan a miqabilê wê ku di Tirkî de jî mewcûd e. Çend nimûneyên gotinên pêşîyan weha ne:

Bira avis bî, bira derengî bî. (Yüklü olsun da geç doğursun.)

Miqabilê wê bi Tirkî: Geç olsun güç olmasın.¹⁷

Hebîbê Nekar, rakev fena her car, Xwedê yek e, derge hezar. (Ey marangoz Habib, her defasındaki gibi uyu, Allah birdir, kapı bindir.)

Miqabilê wê bi Tirkî: “Bir kapıyı kapatırsa bin kapı açar”¹⁸

Herwiha Sêwregî di cihêkî de jî bo gotineke pêşîyan miqabilê wê ya Fransizî jî nivîsîye, weke:

Dê û dotê pev çînî, kêmaqilan înan kir. (Ana ve gelin kavga etmişler, aklı noksan olanlar bunu ciddî telâkki etmişlerdir.)

Miqabilê wê bi Fransizî: Entre l’abre et l’écorce, il ne faut pas mettre le doigt.¹⁹

¹⁵ Hilmîyê Sêwregî, “Kürtlerde Durub-ı Emsal”, *Jîn*, Hejmara 14.

¹⁶ Hilmîyê Sêwregî, “Kürtlerde Durub-ı Emsal”, *Jîn*, Hejmara 14.

¹⁷ Hilmîyê Sêwregî, “Kürtlerde Durub-ı Emsal”, *Jîn*, Hejmara 14.

¹⁸ Hilmîyê Sêwregî, “Kürtlerde Durub-ı Emsal”, *Jîn*, Hejmara 19.

¹⁹ Hilmîyê Sêwregî, “Kürtlerde Durub-ı Emsal”, *Jîn*, Hejmara 24.

Herwiha Sêwregî di gotara xwe de cih daye hin gotinên pêşîyan yên bi Dimilî û di hin gotinên pêşîyan de Kurmancî, Dimilî û Soranî têkelî hev kiriye û nivîsîye. Armanca sereke ya Sêwregî ew e ku hemû zaravayên Kurdî nêzî hev bike û bi vî awayî ji vê yekzimanîyê her Kurd fêm bike.

Gotinên pêşîyan yên bi Dimilî ev in:

Eger tu kotî min pence, ez tu kena îşkence.

Nan padîşah, goşt wezîr, wayê dinan kizîr-mizîr.

Gotinên pêşîyan ên têkelhev:

Ji gez qoşme nabî.

Dema em li vê gotina pêşîyan mêze dikin Kurmancî û Dimilî tekêlhev hatiye nivîsîn.

Mêraniya bê birindê, comerdbûna bê zewacê netaw e.

Dema em li vê gotina pêşîyan mêze dikin Kurmancî û Soranî têkelhev hatiye nivîsîn.

Tablo 1: Gotinên Pêşîyan Yên Ku Ji Aliyê Hilmîyê Sêwregî Ve Di Kovara Jinê De Hatine Weşandin Ev În:

Kurdî	Wergera Tirkî
Eger kûsî çorq e Kurdî xeq e, kûsî ne çorq e Kurdî xeq e.	Kaplumbağa yürürse Kürd gabidir, kaplumbağa yürümezse Kürd gabi değildir.
Kulavê xwe li ser xwe bigire.	Külahını başında tut.
Megere li çiyê kaş, tu nebînî xewnê şaş.	Yokuşlu, muhataralı yerlerde gezme, uykuda kâbûs-ı gam basmasın.
Mî bi lingê xwe, bizin bi lingê xwe.	Koyun kendi ayağıyla, keçi kendi ayağıyla.
Lingê xwe bi mîqdarê lihêfa xwe dirêj ke.	Ayağını yorganına göre uzat.
Yê çav li derîyan, xwefî li serîyan.	Gözleri kapılarda olanların kül başına.
Çê kiro xwe kiro, xirab kiro xwe kiro.	İyilik yapsa kendisine, fenalık yapsa kendisine yapar.
Birîna xwe bi destê xwe derman ke.	Yaranı kendi elinle tedavi et.
Mala mêran, kaniya zêran.	Erkeklerin evi altın çeşmesidir.
Bila rezê min rezan bî, tirî li min heram bî.	Bağlar içinde bağım olsun, üzüm bana haram olsun.
Ji çavê kor histirê sor nayê.	Kör gözden sirik-i sahavet gelmez.
Bira avis bî, bira derengî bî.	Yüklü olsun da geç doğursun.
Golikê rêxo garanê xirab dike.	Fena bir buzağı, bir sürünün namının bozar.
Gurîyê me mir, gukizêrîn bû.	Kel hizmetçimiz öldü, altın saçlı oldu.
Ne şeytanî dibîne, ne eûzu ancîne.	Ne şeytanı görürüm, ne eûzu okurum.
Mirovê merîyan mîna zêrê veşartî ye.	İnsanın akrabası, ihtiyaten hıfz edilmiş bir altuna benzer.
Nanê mêran li ser mêran qer e.	Sahilerin ekmeği cömerdin üzerine borçtur.
Hebîbê Necar, rakev fena her car, Xwedê yek e, derge hezar.	Ey marangoz Habib, her defasındaki gibi uyu, Allah birdir, kapı bindir.
Nabêjin kî kir, dibên kî go.	Demezler "kim yaptı", "kim dedi" derler.
Ga dimirî çerm dimînî, mêr dimirî nav dimînî.	Öküz ölür derisi kalır, erkek ölür ismi kalır.

Tiliya ku şerîet jêkî jê xwîn nayê.	Şeriatın kestiği parmandan kan gelmez.
Sîbe tê, xêr pê ra tê.	Sabah gelir, hayır beraber gelir.
Nan padîşah, goşt wezîr, wayê dinan kizîr-mizîr.	Ekmek padişah, et vezir, diğerleri mukarrebîn, bendegândir.
Pêşîya Royê nayê girtin.	Güneş'in önü alınamaz.
Dinya sîya daran e.	Dünya ağaçların gölgesidir.
Silav li mîyan e, ne li rîyan e.	Selâm koyunlarıdır, sakallara değil.
Derdê dilan hûr i, kûr i, dûr î.	Gönüllerin derdi ufaktır, derindir, uzaktır.
Xelkê ra masîyan digirî, ji xwe ra kûsîyan digirî.	Halka balık tutar, kendine kaplumbağa tutar.
Dilê xezeb nagîyî miradan.	Gazablı yürek muradına nail olmaz.
Xwedê teala li gorê çîyan berf dilbaranî.	Cenab-ı Hak dağlara göre kar yağdırır.
Ereb û rez, Dumilî û pez?	Araba bağ, Zazaya koyun?
Derdê birçîyan tim nan e.	Ac olanların derdi ekmektir.
Eger tu kotî min pence, ez tu kena îşkence.	Eğer sen pençeme düşersen, seni işkenceye koyarım.
Ji gez qoşme nabî.	Süpürge otundan direk olmaz.
Meriyê pîs ji tiştê pîs hez dike.	Fena adam fena şeyden haz duyar.
Mêraniya bê birindê, comerdbûna bê zewacê netaw e.	Yarasız yiğitlik, izdivacsız sahîlik makbul değildir.
Ewê ku mêr bû, çî jin bû çî mêr bû.	Yiğit olduktan sonra ister kadın ister erkek olsun.
Jin hene, jinik hene.	Kadın var, kadıncık var.
Hinek jin in, hinek jan in, hinek melhema dilan in hinek xenimê kundiran in.	Bir kısmı hakkıyla kadındır, bir kısmı refiki için daima muacciz bir hastalık, kısmı da melhem-i dilidir, diğer bir kısmı da hiçbir şey bilmez, ziyandan başka bir şeye yaramaz.
Dê û dotê pev çîni, kêmaqilan înan kir.	Ana ve gelin kavga etmişler, akıli noksan olanlar bunu ciddi telâkki etmişlerdir.
Xidiro, her şev li viro.	Hıdır her akşam buradadır.
Nivîşt, nabî bê tişt.	Nusha bedelsiz olmaz.
Deng li xwedîyan xweş tê.	Ses sahiblerine hoş gelir.
Giyayê hewşê tal e.	Havlide biten otlar acıdır.
Dûr e, nûr e.	Uzaktır, nurdur.
Kêf li Ereban nayê.	Sevinmek Araplara gelmez.

Kurdistana Ezîz

Ev gotara Hilmîyê Sêwregî bi zimanê Tirki, di rojnameya Serbestîyê de hatiye weşandin. Ev gotar di hejmara 492yan ya 11ê Gulana sala 1919an de derketiye. Nivîskar di vê gotara xwe de tiştê ku ji bo welat hewce ne anîye ziman. Herwiha li ser rewşa heyî ya wê serdemê sekinîye. Sêwregî di vê gotara xwe de li ser tevgerên Ecem û Ereban sekinîye. Dibêje nabe ku axa Kurdan bikeve destê wan. Herwiha dibêje hin kes dibêjin ku Kurd û Ecem heman nijad in. Sêwregî dibêje ev xeletîyeke eşkere ye ku Kurd û Ecem ne yek in û du gelên cuda ne. Em dikarin vê yekê bi bûyerên dîrokî jî eşkere û îsbat bikin.²⁰

²⁰ Ji bo agahîyên berfirehtir bnr. *Rojnameya Serbestî* hejmara 492yan sal 1919.

Helbestên Hilmîyê Sêwregî

Helbestên Hilmîyê Sêwregî di hejmarên 22 û 25 yên kovara Jînê de hatine weşandin. Ev her du helbestên wî bi Kurdîya Kurmancî ji bo zarokan hatine nivîsîn. Her du helbest bi zimanekî sade hatine nivîsîn. Sêwregî ev her du helbestên xwe bi kêşa birgeyî nivîsîne.

Helbesta wî ya bi navê “Serê Sibê” bi malikan hatiye nivîsîn û bi tevahî 8 malik in. Helbest bi kêşa birgeyî ya heft kiteyî hatiye nivîsîn. Helbestvan di serê helbesta xwe de nivîsiye ku “Ji bo Zarwê Kurdan 1” em ji serenavê jî dizanin ku Sêwregî ev helbesta xwe ji bo zarokan nivîsiye. Helbestvan di vê helbesta xwe de behsa rojê zarokê gundî dike. Dema serê sibehê ew zarok çî dike an jî çî dibine, Sêwregî bi awayê helbestkî taswîr kiriye û anîye ziman. Helbest ji devê zarokê hatiye veguhestin ango vebêjerê helbestê zarok e û dema mirov helbestê dixwîne mirov wisa hîs dike ku yê diaxive zarok e. Dema em vê helbestê dixwînin em tê de rastî çêja helbesta gelêrî tên, helbest di xwe de hêmayên helbesta gelêrî vedihewîne.

Ji Bo Zarwê Kurdan 1

Serê Sibê

Sibê da zû radibim

Desta dişom, şa dibim

Dayê çêdikî bo me nan

Ji mi ra dibê “biwan”²¹

Mêze dikî kincê min

Derbaz dikî xincê²² min

Bacê min jî cotar î

Xwedê bikî sitarî

Xwenga min dew dinîre²³

Pezê me gişk bişîr e

²¹ Biwan: Bixwe. Biwan peyveke Dimilî ye.

²² Xinc: Kîr, rik, înat.

²³ Dinîre: Dikile.

*Dest birê da bilûr e
Li ber sînga zinêr e*

*Destê dayê ramîstan
Enîya min wê nivîstan*

*Ez çûm xoce bixwînîm
Ke nezanîn nemînîm²⁴*

Helbesta duyem a Sêwregî bi navê “Yekdeng”ê hatiye nivîsîn. Di serê vê helbestê de jî em dîsa rastî îbareya “Ji bo Zarwê Kurdan 2” tên. Em ji vê îbareyê jî fêm dikin ku ev helbest jî ji bo zarokan hatiye nivîsîn, lê di vir de armanc perwerdekirina zarokan e. Sêwregî bal kişandiye ser xwendine û dibêje ku qelem û şûr hemhal in ango îro tu dikarî bi qelema xwe jî şer bikî. Sêwregî bi rêya helbestê xwestiye zarokên Kurdan perwerde bike, ku ew dikarin bi qelema xwe jî bi ser bikevin.

Helbest bi tevahî ji 3 çarîneyan pêk hatiye û bi kêşa birgeyî ya heşt kiteyî hatiye nivîsîn. Zimanê helbestê Kurdîya Kurmancî ye, Sêwregî vê helbesta xwe bi Kurdîyeke sade nivîsîye.

Ji Bo Zarwê Kurdan 2

Yekdeng

*Em ne beg in, ne paşa nin
Em gişk kek in, gişk bira nin
Ji dostan ra canfîda nin
Em belayê dişminan in*

...

*Ders û rastî me heval e
Şûr û qelem me hemhal e
Derbaz nebî meh û sal e
Her cî bibî gul û lale²⁵*

Hemû helbestên Sêwregî kêşdar in; malik û bendên wî jî di nav xwe de serwadar in û paşerwayên wan jî hene û bi vî şeklî helbest xwedî aheng û ritm in. Ev yek jî ji aliyê pedagojîyê ve tiştêkî girîng e û jiberkirina helbestê hêsan dike.

²⁴ Hilmîyê Sêwregî, “Ji Bo Zarwê Kurdan-2 Serê Sibê”, *Jîn*, Hejmara 22.

²⁵ Ji bo hemû helbestê bnr.: Hilmîyê Sêwregî, “Ji Bo Zarwê Kurdan-2 Yekdeng”, *Jîn*, Hejmara 25.

Di Edebîyata Kurdî de Cihê Hilmîyê Sêwregî

Sêwregî di destpêka sedsala 20em de di 19 salîya xwe de dest bi nivîsê kiriye. Sêwregî di temenê xwe yê ciwan de ketiye nav nîqaşên sîyasî, çandî, edebî û folklorî. Wî bi taybetî girîngî daye folklorê Kurdî û hewl daye ku kelûpelên folklorê Kurdî berhev bike. Sêwregî di wê serdemê de gotinên pêşîyan wergerandîye ser zimanê Tirkî û bi yên Tirkî re miqayese kiriye. Em dikarin bibêjin ku wî bi vî awayî miqayeseya hin unsûrên edebîyata Kurdî û Tirkî kiriye. Sêwregî bi van xebatên xwe xwestiye dewlemendîya zimanê Kurdî nîşan bide. Ev xebatên wî û yên Law Reşîd di heyema dawîya Osmanî de xebatên sereke ne. Lewra hem di wan kovaran de hevûdu şopandine û hem jî ev xebatên ku kirine di kovar û rojnameyan de weşandine.

Pêvek 2: Wêneyê Hilmîyê Sêwregî û Malbata Wî.²⁶



Herwiha wî gelekî girîngî daye perwerdeya zarokan û ev yek bi eşkereyî anîye ziman. Wî li ser zarokan helbest nivîsîye û ev helbestên wî bi zimanên zarokan ji bo zarokan hatine nivîsîn. Sêwregî di helbesta xwe ya bi navê “Serê Sibê” de rojeke zarokan anîye ziman û di helbesta ya bi navê “Yekdeng” de jî girîngî daye xwendinê û gotiye hûn dikarin bi qelesa xwe li hemberî şûr bisekinin.

Sêwregî di gotarên xwe de hem li ser rewşa sîyasî ya wê serdemê sekinîye hem jî li ser nestandarbûna zimanê Kurdî sekinîye. Lewra li gor wî zimanê

²⁶ Ev wêne ji Seîd Verroj gihastîye me. Em jê re spasdar in.

Kurdî ne standart e û hemû Kurd ji ber vê yekê ji hev fêm nakin. Li gor Sêwregî divê hemû Kurd ji hev bikin û zimanekî hev girtî saz bikin. Ji ber vê yekê Sêwregî di gotarên xwe de cih daye gotinên pêşîyan ên Dimilî û di hin gotinên pêşîyan de jî bêjeyên Soranî bi kar anîye û di hin gotinên pêşîyan de Dimilî û Kurmancî têkelî hev kiriye. Sedemê vê yekê ev e ku Sêwregî bi vî awayî xwestiye sînorên di navbera zaravayan de rake û zaravayên Kurdî têkelî hev bike û zimanekî hevpar derbixwe holê da ku hemû Kurd bi hêsanî ji hev fêm bikin.

Xulase dema em li atmosfera ku Sêwregî tê de jîyaye mêze dikin tê dîtîn ku vegereke li ser kelûpelên folklorê hebûye. Sêwregî jî li gor atmosfera wê serdemê hewl daye gavekê ji bo edebîyata Kurdî biavêje û kelûpelên Kurdî berhev bike.

Encam

Hilmîyê Sêwregî rewşenbîrekî sedsala 20em e û ji navçeya Sêwrega Rihayê ye. Sêwregî li Stenbolê di peymangeha PTTê xwendîye û li postaxaneyê dest bi kar kiriye.

Sêwregî di serdema xwe de di kovar û rojnameyan de roleke çalak lîstîye. Wî di van kovar û rojnameyan de nivîs, gotar û helbest weşandiye. Lê ji ber ku rojname û kovarên ku wî tê de nivîsîye bi temamî negihaştine ber destê me, em jî hemû gotar û nivîsên wî ne haydar in û dibe ku di siberojê de nivîs, helbest û gotarên wê yên dîtir jî derkevin meydanê.

Em jî gotarên wî fêm dikin ku wî perwerdeyeke baş wergirtiye û hakimê du zaravayên Kurdî bûye û Tirkî zanîna wî di asteke baş de bûye. Lewra Sêwregî gotinên pêşîyan yên Kurdî wergerandiye ser zimanê Tirkî û herwiha di gotara xwe de gotineke pêşîyan ji bo Fransîzî jî wergerandiye, em jî vê wergerê tê derdixin ku Sêwregî Fransîzî jî zanîbûye.

Gotareke Sêwregî di rojnameya Serbestîyê de û 6 gotar û 2 helbestên wî jî di rojnameya Jînê de weşîyane. Di gotarên wî de em rastî alîyê wî yê sîyasî û edebî tîne. Zimanê 6 gotarên Sêwregî bi Tirkî ye û gotarek û helbestên wî jî bi Kurdîya Kurmancî ne.

Sêwregî di kovarê de li pey şopa Law Reşîd çûye û gotinên pêşîyan yên herêma Sêwregê berhev kirine û nivîsîne. Sêwregî di sê gotaran de li ser gotinên pêşîyan sekîniye û di dawîya gotara xwe ya dawî de gotiye ku dewama wê heye. Lê ji ber ku em negihaştin hejmarên wendayî, em nizanin ka wî di wan hejmaran de çi nivîsîye. Sêwregî di sê gotaran de cih daye gotinên pêşîyan ên Kurmancî û Dimilî. Herwiha wî ev gotinên pêşîyan wergerandiye Tirkî û di çend cihan de miqabilê wan ên bi Tirkî jî daye. Sêwregî di yek cihekî de gotinekî pêşîyan ji bo Fransîzî jî wergerandiye.

Herwiha Sêwregî di gotareke xwe de bal kişandiye ser nestandartbûna zimanê Kurdî û li gor wî divê zimanê Kurdî standart bibe da ku hemû Kurd bikaribin ji hev fêhm bikin.

Dema em li helbestên wî mêze dikin her du helbest jî ji bo zarokan hatine nivîsîn. Di van her du helbestan de Sêwregî xwestiye zarokan perwerde bike. Her du helbestên Sêwregî jî bi kêşa birgeyî hatine nivîsîn. Malik û bendên helbestên wî jî di nav xwe de hemserwa ne û xwedî aheng in.

Sêwregî di xebatên xwe de girîngî daye ziman, folklor, çand û perwerdeya zarokên Kurdan. Wî xwestiye bi van gotarên xwe di van meseleyên de hişmendîya di nav Kurdan de pêşdetir bibe û van probleman çareser bike.

Çavkanî

- Bozarslan, M. Emîn, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî & Kürdçe-Türkçe Dergi (1918-1919)*, c.1, Weşanxaneya Deng, Uppsala 1985.
- — —, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî & Kürdçe-Türkçe Dergi (1918-1919)*, c.2, Weşanxaneya Deng, Uppsala 1985.
- — —, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî & Kürdçe-Türkçe Dergi (1918-1919)*, c.3, Weşanxaneya Deng, Uppsala 1985.
- — —, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî & Kürdçe-Türkçe Dergi (1918-1919)*, c.4, Weşanxaneya Deng, Uppsala 1985.
- — —, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî & Kürdçe-Türkçe Dergi (1918-1919)*, c.5, Weşanxaneya Deng, Uppsala 1985.
- Coşkun, Mustafa, *"Mevlanazade Rıfat Bey'in Gazetecilik Hayatı ve Siyasi Faliyetleri"*, (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Tarih Anabilim Dalı Türkiye Cumhuriyeti Tarihi Bilim Dalı, İstanbul 2019.
- Pertev, Ramazan, *"Xebateke Girîng di Dîroka Folklorê Kurdî de: Kemal Fewzî û Berhevkarîya Çîrokên Kurdî"*, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, cild. 2 hej. 3, 2016, r. 44.
- — —, *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî (1898-1946)*, Weşanên Avesta, Stenbol 2018.
- Veroj, Seîd, *Mewlanazade Rıfat û Serbestî*, Weşanên ÎBV, Stenbol 2017.
- — —, *Seîd, Potreyên Şophîştî-I*, Weşanên Dara, Diyarbekir 2019.
- Serbestî Gazetesi ve Mevlanzade Rıfat Bey- Bernamegeh <https://www.bernamegeh.com/serbesti-gazetesi-ve-mevlanazade-rifat-bey/> (Dema Gihandinê 26.04.2022).